zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT

www.arsivakurdi.org

Sal: 1986

www.arsivakurdi.org

# ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

# HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

# CÎROK Û MESELÊN XWE

# JI WERE BÊJEN

KULÎLK

www.arsivakurdi.org

# ZILAM U BEQ

Dibê zilamek hebû.Rojek ê zilam dihere ber çemekî,li wê derê beqekê dibîne.Beq tê himberî zilam û xwe tund dike.Dilê zilam dikeve çavên beqê.

Ji ber wê yekê,zilam her roj tê ser çem û banî beqê dike:

www.arsivakurdi.org



www.arsivakurdi.org

Beqê beqê,
beq belûsê,
Were lûsê,
ez ramûsim
çavên Hûsê,
û dîsa here.

Bi wî awayî beq ji avê derdiket û dihat cem mêrik,merik jî çavên beqê maçî dikir.

Pîreka mêrik didît ku mêrê wê her roj dehere ser çem ûqederekî li wê derê dimîne.



www.arsivakurdi.org

Jina mêrik meraq dike û rojekê bi dizî dide dû mêrê xwe.Jinik dibîne,ku mêrê wê wan tiştanan ji beqê re dibêje û beq jî avê derdikeve û mêrê wê çavên beqê maçî dike.

Jinik ji wî tiştî gelek diqehire û roja din ew bi tenê tê ser çem.Jinik jî,bi awayê ku mêrê wê banî beqê dikir,banî beqê kir :

www.arsivakurdi.org

Beqê beqê,
beq belûsê,
were lûse,
ez ramûsim
çavên Hûsê,
û dîsa here.

Gava jinik wilo dibêje,beq ji avê derdikeve û ber bi jinikê tê.

Jinik,şîşê di her du çavên beqê radike û çavên beqa reben kor dike.

Mêrê jinikê,dû re tê ser çem û wek her car banî beqê dike.Lê we carê beq wek her car dernakeve û li mêrik vedigerîne:

Ez ne têm û ne qetê,
jinka te yî bi qebhetê,
çavên min kir bivetê...

Berevkar: PÎRO

www.arsivakurdi.org

# KEÇA KURDA

Şala reş bavê ser xwe,
Rabe were mala me
Kurdî,rindî,delalî
Pir şêrînî li ba me.
Keça kurda bûka me,
Qîza kurda bûka me.
Ji bo kurda tu negrî
Rindê,yarê tu nemrî
Kurdê,rindê,delalê
Ji bo merda ez gorî.
Keça kurda bûka me,
Qîza kurda bûka me.
Çi hat serê gelê me
Nema heval dostê me
Tu ji bo welat negrî
Bawer bike doza me.
Keça kurda bûka me,
Qîza kurda bûka me.

1987-KURDÎSTAN

ŞAXÊ CIWAN

www.arsivakurdi.org

Notenivîs:Cemîla Celîl

# XIRPANÎ




De bi lor. lor. lor. xirpanî,
De bi lor. lor. lor. xirpanî.

Malê me me mesrê danî,
De bi lor. lor. lor, xirpanî.

Mesra teng bû hilneanî,
De bi lor, lor. lor. xirpanî.

Lawkno lêxin řojkanî,
De bi lor, lor. lor, xirpanî.

Çil qant'iřê qeremanî,
De bi lor, lor, lor, xirpanî,

Çil berdîrê doşanî,
De bi lor. lor. lor, xirpanî,

Qelena k'awa min deranî,
De bi lor. lor. lor, xirpanî,

Ha(w)îro, (w)îro, (w)îro,
De bi lor, lor. lor. xirpanî.

Me li bang da dîkê nîvro,
De bi lor, lor. lor, xirpanî.

Kuřno, qîzna ha lêxin,
De bi lor, lor, lor, xirpanî.

Lawkno, lêxin řojkanî,
De bi lor, lor. lor. xirpanî.

Ha sibeye, te'vê daye,
De bi lor, lor, lor. xirpanî,

Zêřa e'nyê xûdaye,
De bi lor, lor. lor. xirpanî.

Ha sibeye, te'v zeriqî,
De bi lor, lor, lor. xirpanî.

Zêřa e'nyê biriqî,
De bi lor. lor. lor. xirpanî.

Ser sîngê zer t'iviqi,
De bi lor, lor, lor, xirpanî.

www.arsivakurdi.org

# QUNCIKA DÛRIKÊN ZAROKAN

Ji Komîta Kulîlk e re!

Birayê delal!

Ez gelek kefxweş bûm,ku Kulîlk dîsa dest bi weşana xwe kir.Lewra,demek dirêj çavê me li derketina wê bû.

Di hijmara 25 de,we "Quncika Dûrikan" quncikek nû wekirîye.Bê gûman ew tiştek kî gelek di cî de ye.Wek we jî diyar kiri bû,di bê em bi hevdu re we Quncikê jî zengîn bikin.

Bo wê yek ê,mi jî çend dûrik ji were dan hev û ez,wana jî were dişînim.

Bi gelek silavên germ û biratî.....

Bavê Hêvî

---

-1-

Mişko mişko mişkelî
Ket bêrîka Evdelî
Evdelî birê fatê
Keçik birin liqat e.

-2-

Lek û lek,
teyrê belek,
naza bilbil,
dermanê dil,
şîr û şima,
kuştina mêra
li ber çema,
av tê ne ma.

-3-

Kê wer lîsk ê
Ber perê qalîsk ê
Qalîska dermana
Firîya ezmana
Xwedo xwedanî te me
Çav reş kildanî te me
Neynik danî xemilî
Xemla wê ji paçê gulî
Ez kuncî tu narincî
Ser doşeka birincî
Ser textikê firincî
Ez firîyam tu ma li cî.

(Ev dûrika, ji devê keçikek 8 salî navê wê Gulşîyar e, hatîye nivîsandin.)



www.arsivakurdi.org

NAVÊ VAN FÊKÎ Û ŞÎNKAYAN LÎ BÎNÊ WAN **BİNİVÎSİN**



. . . . . .

. . . . . .

. . . . . .

. . . . . .

. . . . . .

. . . . . .

. . . . . .

. . . . . .

www.arsivakurdi.org

## EY WELAT

Ronakî çavim pêtî çiraxem
Çaxim nemaye idî çira xem
Hiugi ciwan bûm ev şax û baxem
Melhem didan ber birîn û daxem

Ji bo te jîna xoş û ciwanî
Hemî me borand bi dilgiranî

Jîna ciwanî hemî bihar bû
Weşim çi xurt bû hişim şiyar bû
herkes dixwestim tenê tu yar bû
Geş bû dilê min ten berxwedar bû

Jî bo te jîna xoş û ciwanî
hemî me borsnd bi dilgirenî

heta ciwan bûm porê me reş bû
Dara me şîn bû guta me geş bû
Çavêm li peş bûn, evîn çi xweş bû
Te dil ji min bir rengê keleş bû

Ji bo te jîna xoş û ciwanî
Hemî me borand bi dilgiranî

Îro ciwanî pişta xwe da min
Serim sipî bû, pîrî giha min
Bayê ecel het zor da çira min
Hatin weşandin pelê gula min

Ji bo te jîna xoş û ciwanî
Hemî me borand bi dilgiranî

Bi kul me borand demên buharî
Xoşi me gorand bi ah û zarî
Şebnem li jînam nema dîbarî
Roj çûye ava şev bûye tarî

Ji bo te jîna xoş û ciwanî
Hemî me borand bi dilgiranî

Jîna derûnim derbas bikim ez
Perda şiyarî da rabikim ez
Bi pêş ve çeng bim ah ma çikim ez
Hukmê tetewir lê bê şikim ez

Ji bo te jîna xoş û ciwanî
Hemî me borand bi dilgiranî

CİGERXWÎN

www.arsivakurdi.org

Dibê hebû pîrek,gelek suxre bi xelkê dikir. Kî di ber derîyê wê re derbas biba,pîrê suxrak bi wan dikir.

Pîrê bi wî awayê xwe,bi nav û deng ket. Dêngê pîrê gîhaşt axayê gund jî. Evdî axa jî gelek meraq kir û berê xwe da mala pîrê, da ku bibîni gelo ew tiştîn di derheqa pîrê de dihatin gotin rast in an ne rast in.

Evdî axa hîn ne gîhabû hundur,pêjna wî hat pîrê.

www.arsivakurdi.org

Pîrê bê ku wî nas bike got:

-Lawikê min! Gelo ew kî ye,wî destarî bi xêra xwe ji min re bîne hundur.

Evdî axa rahişt destar û çû hundur cem pîrê.Pîrê dît,ku Evdî axa ye,ji Evdî axa re got :

-Wî lawikê min! Evdî axa tu ye?De bivi bivi,mi ne zanî bû tu ye.

Evdî axa vedigere odê,zilam meraq dikin û ji Evdî axa dipirsin:

-Ha axa! Ma wilo bû yan na?

-Belê,weleh wilo bû.Lê hûn dîsa bi şansin. Pîrê herkê suxrak bi we dikir,ê mi du suxre bi min kir.

Berevkar :Bavê Hêvî

www.arsivakurdi.org

# HEJMARAN BIGIHÎNIN HEV

www.ferhengakurdi.org

# M A R Ş A  T Î P A N

Em şagirt in,em dixwînin, A.B.C.
Nivîsandin,ew ji me re,armanc e.
Tîpên me tev sî û yek in, Ç.D.E.
Xweşî ev e,bi zimanê Kurmanc e.

Ê.F.G.H. him rihet e,him şêrîn.
İ.Î.J.K. xweş dixwînim bi qîrîn.
L.M.N.O. hê mayîne hinên din.
Gelî Kurdan,werin tev de bixwînîn.

P.Q.R.S.Ş.T.Û.U. tu meyze.
V.W.X. ne, ez şaş nakim yek levze.
Heşt degdêr in,heçî dengdar bist û sê.
Riya ronî dibistan e, ma Y.Z..

HISENÊ EMİN

Ronahî,hejmar:25
Çapxana Tereqiye
Sal : 1944



www.arsivakurdi.org

ÇÎROK

Berevkar:Mirze

## FERMANA ROVÎYAN

Rojekê fermana rovîyan radibe.Rovî berê xwe didin çîyê û direvin.Di nav rovîyan de yekî gelek teral û bixwere nedî heye.Ew li dawiya êlê dimîne.Rovîyê teral di nav gun-

dekî re derbas dibe û kes li rovî hay nabe Rovî bawer dike,ku fermana wan ji holê rabûye û efûya wan hatîye.

Gava rovî dighêje nav hevalên xwe, ji wan re dibêje:



-Gelî hevalan! Edî hûn dikarin vegerin cî û warên xwe.Efûa me hatîye.Ez di nav gund re jî derbas bûm û kesekî dest min ne da.Eger hûn bawer nakin,va ye kaxeza resmî jî bi min re ye.

Rovî ser peyva hevalên xwe,xwe ji çîyê berdidin û vedigerin warên xwe yên berê.

Pir debas nabe,dibînin nêçîrvan li we der û dorê digerin.Yek ji nav rovîyan kaxezê dixe devê xwe û berê xwe dide neçîrvanan.Nêçînvan bera dû rovî didin.Rovî bi lez û bez li hevalên xwe vedigere.

www.kesivakurdi.org

Hevalên wî jê dipirsin:

-Xêr e birako! Tu ji bo çi wilo direve?

-Lawo birevin! Neçîrvan li dû me ne.

-Ma efûya me ne hatibû û qaşo kaxeza resmî bi te re bû.

-Belê rast e,kaxez bi min re bû.Lê yê ku kaxezê dixwîne kî ye...



www.arsivakurdi.org

NAVÊ YAN HEYWANAN LI BIRÊ JAN BİNİVÎSİN



.....

.....



.....

.....



.....

.....

.....



.....

www.arsivakurdi.org

# QUNCIKA PÊZANÎN Ê

1- Tiştekî min heye;ser minare ye,orte cehnime ye,binî bahre,ew çî ye?

.....

2- Tiştekî min heye;ser du beşta ye,orte aşxane ye,ser jî gîha ye,ew çî ye?

.....

3- Tiştekî min heye;di ku werbi namre,di avê werdibi dimre,ew çî ye?

.....

4- Tiştekî min heye;sipî ye,bê dest û bê derî ye,ew çî ye?

.....

5-Tiştekî min heye;ne li erde ne li ezmane, hêlîna beg rewan e,kilît li cem sultan e,ew çî ye?

.....

6- Tiştekî min heye;bi çav û bi nige,lê ne dibîni û ne dimeşi,ew çî ye?

.....

www.arsivakurdi.org

Di nav her du resman de, 5 tişt ne wek hev in.Ma hûn dikarin wan bibînin ?



www.arsivakurdi.org









www.arsivakurdi.org

## BERSÎVÊN QUNCIKA PÊZANÎN Ê.

Pirs : 1
Çel û çar û çarde,bîst û bênc û banzde,hivdak û du hîjde gelo diki çu qasî ?
Bersîv: (151).....

Pirs : 2
Kumê hûtuk tije,nûtuk çî ye?
Bersîv: (Hijîr).....

Pirs : 3
Tenûra xim ximî,tije nanê genimî,çî ye?
Bersîv: (Gûz).....

Pirs : 4
Ji bivir girantir e,ji şekir şêrintir e,çî ye?
Bersîv: (Xew).....

Pirs : 5
Hilindir milindir kur ji bavê bilintir,çî ye?
Bersiv: (Dûyê êgir).....

Pirs : 6
Li vira go xişt,li wira go xişt,li derê han kulê lê da kuşt. çî ye?
Bersîv: (Bermalk-Melkeş)....

www.arsivakurdi.org

# BERSÎVA XAÇEPIRSA HÊJMARA BÎST Û BÊNÇAN

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3→ | D | İ | R | Ê | N | C | E | K |
| | | 2→ | G | U | N | D | | |
| | 1↓ | H | Ê | L | Î | N | ← 12 | |
| | | E | | | | | | |
| 4→ | S | E | L | İ | K | | | |
| 5→ | P | Î | N | İ | K | | | |
| | | I | | B | E | Q | ←7 | |
| 6→ | K | Û | Z | | | | | |
| 8→ | Ê | Z | İ | N | G | | | |
| 9→ | H | E | S | K | | | | |
| | | E | | | | | | |
| 10→ | S | A | T | İ | L | | | |
| | | İ | | | | | | |
| | | N | | | | | | |
| 11→ | Î | S | O | T | | | | |

1

12

-2-

3

4

6

7

8

9

10

11


-5-
Mala Mirîjkê.

"Ez kulîl im kulîlk im
Ez kulîlka Kurda me
Kovara şagirta me
Diyarî zaroka me "

KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDURKÎ ME

KERÊ ME KUNDURÊ ME KOT KOT KOT,

ME JÎ ÇÎROK Û MESELÊN XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERÊ GOT

KULÎLK

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

YAN

# KURDISTAN

YAN NEMAN !


UTGIVARE

**KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING**

**WEŞANA KOÇ - KAK**

**KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ**

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0


PRIS : 10:- skr

BIHA

www.arsivakurdi.org